# Kûçikê Daleqandî

*Berhevkar:*
**Dîyarî Asûr**

WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ

**Dîyarî Asûr,** di sala 1987an da li Batmanê hat dinyayê. Li Zanîngeha Çûkûrovayê beşa fîlozofîyê xwend.

## Naverok

PÊŞGOTIN / 7
TIMAYÎ GÛ BI ÎNSANA DIDE XWARINÊ / 9
MELE ÇÎVÎ / 13
KÛÇIKÊ DALEQANDÎ / 21
ÇÎROKA LI SER QEDERÊ / 31
DEREWÇÎ / 43
XEWNA QAZÎ / 49
HESAMÊ AXÊ / 51
KALO Û PÎRA FATÊ / 63
ÇÎROKA STENBOLÊ, DARÊ ÇAM E / 79
ELO RÛVÎ / 103
FETLÛFEN / 123
NAVÊ ÎNSANA BIPIRSE / 143
BAHLÛL Û GIRTÎYÊ HÊSA / 149
BAHLÛL Û MALA HEQ Û DEREWÎN / 153
ÇÎROKA PADÎŞAH Û LEGLEGÊ / 155

**Pêşgotin**

Folklor, gencîneya herî hêja ya miletan e. Bîr û raya miletî, rabûn û rûniştina wî, urf û adetên wî, sewt û awaz û raman û feraseta miletekî di nav behra folklorê da jîndar dibe, xwe nîşan dide. Hemû warên jîyanê xwe li folklorê digirin, folklor ji hunerê heta edebîyatê heta ilmên zanistî hemû waran xweyî dike.

Kurd, bi folklora xwe ya zengîn tên nasîn, ew zengînî gihîştîye wê dereceyê ku her kesê ku hatîye Kurdistanê pêşî çav li wê kirîye, Celadet Alî Bedirxanî nêzî sed sal berê bala xwe daye vê yekê û di Hawarê da gotîye, *di dinyayê da folklora tu miletî nagihîje dereceya folklora kurdan.* Folklora me wisa zengîn e ku hûn herin kîjan gundî hûn xwe bidin ber kîjan kal û pîrî dê gotin jê bibarin, dê çîrok û xebroşk heta sibehan li ber xwe bidin, folklora kurdan wekî kanîyeka boş diherike.

Kar û barên berhevkirina keresteyên folklorê, teorîyên di vî warî da, li dinyayê berbelav in, herçiqas folklor kanî be û zû bi zû nemiçiqe jî divê tim berhevkarî bê kirin û ew mîrate bê parastin, roj bi roj feyza wê kanîyê kêm dibe, rewşa zimanê kurdî ya malkambax jî rê li ber miçiqîna wê kanîyê vedike. Kurd êdî wekî berê şevbihêrkan çênakin, odeyên wan tune ne û gotinên xwe wekî berê neqil nakin. Loma divê em demildest xwe di vî warî da bigihînin û nesekinin, dest bi berhevkarîyê bikin. Bi vê boneyê me di sala 2017an da di bin banê Weqfa xwe da bi beşdarîya 20 berhevkaran û 6 mamosteyan perwerdehîya folklorê da destpêkirin. Piştî perwerdeyê Weqfa me cîhaz û materyalên teknîkî bo berhevkaran peyda kirin û hevalên me dest bi berhevkirin û deşîfrasyona keresteyan kirin. Divê perwerdehîyê da 10 berhemên folklorê gihan ber destê me. Ev berhem, yek ji wan berheman e ku li herêma Batmanê hatîye berhevkirin.

Weqfa me, piştî xebata perwerdeyê, bi derxistina kovara “Folklora Me” xebata xwe ya di vî warî da geş kir. Em hêvîdar in gelek kurd û gelek sazî xwe bidin ber vî barê pîroz û em bikarin bi lezgînî karê berhevkarîyê bikin, keresteyên folklora xwe berhev bikin. Wext li me dereng e, her roj her deqîqe, ev mîrate, ev zengînî noqî bin avê dibe. Bi avakirina sazîya folklora kurdan, bi rêya perwerde û berhevkirinê em dikarin vê mîrateyê nemir bikin.

Weqfa Mezopotamyayê